# DEWR Û GERA KURDISTANÊ

Mela Ehmedê Palo

Amadekar: Mehmet Yıldırımçakar



Nûbihar

# DEWR Û GERA KURDISTANÊ

Mela Ehmedê Palo

Amadekar
**Mehmet Yıldırımçakar**

Nûbihar

**Mela Ehmedê**: Palo, di sala 1920an de li gundê Palo Sêraçurê hatiye dinyayê. Di roja 9ê gulana 1991ê de li rojavayê Kurdistanê, li gundê Qamişlo Cirnikê çûye rehmetê. Li gundê nêzîkî wê, li goristana Mehmeqiya defin bûye. Li Kurdistana Rojavayê bi navên “Ehmedê Palo”, “Mela Ehmedê Palo”, “Mele Palo” yan jî tenê “Palo” tê nasîn.

# NAVEROK

PÊŞGOTIN ........ 9
JIYAN Û BERHEMÊN MELA EHMEDÊ PALO ........ 11

**DEWR Û GERA KURDISTANÊ** ........ 23
GERA WELAT ........ 25
BERSIVA WELAT ........ 27
GERA GELÊ WELAT ........ 32
BILBILÊ XEMGÎN Û WELATÊ ŞÊRÎN ........ 38
CIHÊ MIN BERDIDA XWÎNÎ ........ 41
HÊLEK JI KURDISTAN ........ 43
DENGÊ BÊGAZÎ ........ 47
ROJEK BÊWIJDAN ........ 50
GUNDÊ BÊWIJDAN ........ 53
DIÇIM HICRÊ BERÊ XWE NADIM DÊ ........ 55
BELA BEGARA ........ 60
MEDRESA PÎRÊ GEROKE ........ 63
BINDESTÎYA KUR Û DÊ ........ 65
WELATPARÊZÎ ........ 68
WELAT ........ 70
EVÎNA WELAT Û DIGEL NÎŞANA ŞEHÎDAN ........ 73
DIYA WELAT ........ 76
KURÊ WELAT ........ 79
BINDESTIYA KURÊ MEZIN ........ 85
TEVGERA BÊNEJADÎ ........ 88
KURÊ DIWAN ........ 91

KURÊ SIYAN.......... 96
TEVGERA XAINAN.......... 101
KURÊ ÇARAN.......... 103
KURÊ PÊNCA.......... 106
DÎNA WARE BILIND.......... 109
FIRAT.......... 114
DÎCLE.......... 121
PALO - I.......... 127
DÎTINA PALO DAXWAZA MIN E.......... 132
HIN ÇIYAYÊN KURDISTANÊ.......... 135
ERARAT.......... 137
DERSÎM - I.......... 140
AMED / DIYARBEKIR.......... 150
MIHABAD.......... 155
PALO - II.......... 164
CÊBAXÇÛR.......... 168
EZIRGAN.......... 171
XARPUT.......... 175
MELATÎ.......... 179
DERSÎM - II.......... 182
ÇIYAYÊN DERSÎM.......... 185
ÊLÊN DERSÎM.......... 187
ERZURÛM.......... 189
MÛŞ Û WAN.......... 194
BEDLÎS.......... 198
DÛRKIRINA ÇEND MEZINÊN BEDLÎSÊ.......... 202
SÊRT.......... 204
MÊRDÎN.......... 207
JINA ZORBAR.......... 211
MIROVÊ BIRÎNDAR.......... 212
HECIYÊ BÊHIŞ.......... 214
RIHA / URFA.......... 217
ANTAB Û MERAŞ.......... 221
KILIS.......... 224
CIZÎR.......... 226

HEKARÊ ........ 230
REWAN ........ 235
BERZAN ........ 241
ŞEHREZOR Û SULEYMANÎ ........ 250
SENENDAC / SENEDIZ ........ 254
ÇEND CIHÊN KU Kurd TÊ DA CÎ DIBIN ........ 256
HIN CIHÊN DIN ........ 261
DAWÎ ........ 265

FERHENGOK ........ 267

# PÊŞGOTIN

Min navê Mela Ehmedê Palo cara ewil di Hezîrana sala 2015an de, li ser tora înternetê, bi saya gotara Roşan Lezgînî ya li ser malpera “www.zazakî.net”ê, bi navê “Kayıp Bir Kürd Aydını: Mela Ehmedê Palo” weşiyabû, bihîst. Roşan Lezgînî di dawiya gotarê de bang li xwendekarên Kurd yên ku li ser ziman, çand û edebiyata Kurdî masterê dikin, dikir û dixwest ku li ser jiyan û berhemên Mela Ehmedî bixebitin, tezan amade bikin. Ez li Zanîngeha Mûş Alparslanê, di Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de xwendekarê masterê bûm. Lewre min xwe yek ji wan muxataban hesab kir û li ser facebookê, bi Lezgînî re têkilî danî û xwest ku ez li ser berhemên Mela Ehmedî bixebitim. Wî jî ji kurê Mela Ehmedî, Rêzan Paloyî destûr hilda, ji bo min bû referans. Ji ber ku Rêzan Palo wê demê ji Qamişloyê koç kiribû, hatibû li Nisêbînê bi cî bibû, ez bi rê ketim, çûm Nisêbînê. Ez du roj li mala wî bûm mêvan. Min çapa duyem ya berhema Mela Ehmedî, ya bi navê “Dewr û Gera Kurdistanê” jî wergirt û ez bi ser Amedê re vegeriyam Wanê. Li Amedê min û kekê Roşan Lezgînî me cara yekem rû bi rû hev û du nas kir, li ser berhemên Mela Ehmedê Palo suhbet kir.

Piştî ez hatim malê, min ev berhem xwend. Min dît ku ji ber şert û mercên wî zemanî baş nehatiye amadekirin, bitaybetî ji hêla rastnivîsînê ve gelekî xeletî tê de hebûn, loma min xwest ez vê berhemê ji nû ve binivîsim.

Mela Ehmedî “Dewr û Gera Kurdistanê”, berîya mirina

xwe di 27ê Nîsana 1981an de ji destxeta xwe ya bi tîpên 'Erebî, latînîze kiriye, ji bo çapê amade kiriye û bi mexlesa "P. Zerwan" kurtejiyana xwe jî di destpêka pirtûkê de nivisiye. Lê ji ber çend sedeman ev berhem wê hingê neweşiyaye. Piştî mirina Mela Ehmedî, di sala 1994an de hatiye weşandin. Ji bo vê xebatê me ev çap esas girt û li gorî rastnivîsîna Kurmancî, bêyî ku eslê wan biguherînin, me ji nû ve nivîsîn. Jêrenotên ku Mela Ehmedî bi xwe danîbûn, ew jî li gorî rastnivîsîna Kurmancî me sererast kirin û dîsa lê zêde kirin. Me ferhengokek jî, ji jêrenotên ku wî bi xwe danîbûn, amade kir û danî dawîya berhemê. Dîsa Roşan Lezgînî ji bo vê çapê bi sernavê "**Jiyan û Berhemên Mela Ehmedê Palo**" nivîsek nivîsî. Me ev nivîs danî pêşiya berhemê.

Di vê xebatê de gelek dost û hevalan piştgirî dan min, ji min re bûn arîkar. Di serî de ez spasî ji Roşan Lezgînî re dikim ku, bêyî min nas bike, bawerî bi min anî û ji min re bû referans da ku kurê Mela Ehmedê Palo, Rêzan Palo, destûra xebata li ser berhemên Mela Ehmedî bide min. Û dîsa di pêvajoya xebatê de ji hêla moral û motîvasyonê ve gelek arîkariya min kir, di pêvajoya çapê de jî hemî metnên di vê kitêbê de ji serî heya binî, bi hûrgilî xwendin û sererast kirin. Kek Rêzan Palo jî di vê pêvajoyê de, her dem bi min re di têkiliyê de bû. Ez çend roj li mala wî bûm mêvan. Di ji nû ve nivîsîna berhemê de, xalê min Weysel Yildirimçakar û hevalê wî Hîkmet Akdağ, hemû helbest ji min re xwendin û min jî li ber xwendina wan xeletiyên xwe sererast kirin. Dîsa di sererastkirina metnan de hevalê min Yakup Aykaçî jî gelek arîkariya min kir. Ez ji dil û can spasiya xwe pêşkêşî cenabê wan dikim.

**Mehmet Yıldırımçakar**
**Wan, 21.03.2017**